dikin û şer li çend taxan jî berdewam e. Peyamnêrê Rûdawê li nêzik sînore Kobanî Imer Kalo ragihand: "Çekdarên DAIŞê Kaniya Mişidê û Daristana Kobanê topbaran dike." Imer Kalo wiha domand: "Hêzên Pêşmerge vê sibehê bi çekên giran çeperên DAIŞê didin ber topan." Fermandarê Hêzên Pêşmerge li Kobanî Ehmed Gerdî jî Rûdawê re ragihand: "Şeva borî çekdarên DAIŞê hewl dan ku ji aliyê başûrê bajêr ve ji aliyê rêya Helebê ve, êrişî hêzên kurdî bike, lê êrişa wan ji aliyê hêzên kurdî ve hat pûçkirin." Ehmed Gerdî wiha domand: "Hêzên kurdî ji aliyê başûrê Kobanî ve jî 2 kolanên pêşve çûne û çekdarên DAIŞê paş vedikişan." Peyamnêrê Rûdawê wiha got: "Îro berî nîvro, topeke DAIŞê li nêzikî sînore di navbera Kobanî û Bakurê Kurdistanê, ket." Imer Kalo da zanîn ku, "Îro seat 4ê sibehê, balafirên şer ên hevpeymanîya navdewletî cihên DAIŞê li taxa Pişesaziye û Baxçê Hecî Reşîd li rohilatê Kobanî bombebaran kirin."

Alîkariyên welatê Polonyayê gihîştin Kurdistanê

Hewlêr (Rûdaw)- Îro balafireke welatê Polonyayê alîkariyên mirovî anî Başûrê Kurdis-



tanê. Li gorî agahiyên Rûdawê, Polonyayê balafirek alîkariyên mirovî ji Başûrê Kurdistanê re şand û îro gihîşt Balafirgeha Hewlêrê. Ew alîkarî 10 ton xwarin û pêdviyên dinin. Piştî êrişên DAIŞê li ser Iraqê û Başûr û Rojavayê Kurdistanê hejmarek mezin ji koçber û penberan berê xwe dan Herêma Kurdistanê, lewma çend welatan hevkarîyên mirovî ji Kurdistanê re şandin. Herwiha alîkariyên leşkerî jî dişînin.

Dê wek keçên kurdan şerê DAIŞê bikin

Rûdaw (Enbar)- Keç û jinên Iraqê ji keçên kurdan fêr bûne û dê rajin çek û şerê çekdarên DAIŞê bikin. Sekreterê Giştî yê Encumena



Eşîretên Şoreşa Iraqê Yehya Sunbil ji Rûdawê re ragihand: "Li parêzgeha Enbarê ya Iraqî, komek çekdarî ya jinan bi navê "Benta el-Heq" tê pêkanîn ji bo şerê li dijî çekdarên rêxistina DAIŞê li wê parêzgehê." Yehya Sunbil wiha domand: "Ew bi xwe, jin û dayikên kuştîyên DAIŞê ne, wek xwebexş navê xwe nivîsîne ji bo şerê li dijî çekdarên rêxistina DAIŞê, li wê parêzgehê." Sunbil da zanîn ku, "Ew jin ku dê perwerdeya leşkerî bibînin, da ku ligel şervanên zîlam û xortên Enbarê şer li dijî DAIŞê bikin." Tevî ku ew kom rastî rexneyan hatiye, ku li dervayê artêşa Iraqê rahijîne çek, lê dîsa gellek alî piştewaniyê li wan dikin.

Barzanî û Sakik behsa Kongreya Neteweyî kirin

Îro pêncşem 13.11.2014 li Selahehdîn birêz Mesûd Barzanî Serokê Herêma Kurdistanê pêşwaziya Sirri Sakik Serokê Bajarvaniya Agirî kir.

Îro pêncşem 13.11.2014 li Selahehdîn birêz Mesûd Barzanî Serokê Herêma Kurdistanê pêşwaziya Sirri Sakik Serokê Bajarvaniya Agirî kir.

Li hevdişînê de ku Fuad Husên Serokê Dîwana Serokayetiya Herêma Kurdistanê amade bû Serokê Bajarvaniya Agirî ji bo rexsandina vê hevdişînê spasiya Serok Barzanî kir û ji bilî balkişandina pêşveçûna doza Kurd li Bakûr tekez li wê yekê kir ku rêkarên aştî û karên siyasî doza Kurd bihêztir dike. Her wiha spasiya Serok Barzanî û Herêma Kurdistanê kir ji bo yarmetîdana Rojava û Kobanê û ragihand ku çûna Pêşmerge ji bo yarmetîdana xuşk û birayên li Kobanê hengavekî dîrokî bû û dilê hemû Kurdekî li cihanê şad kir. Serokê Bajarvaniya Agirî rola Serok Barzanî li yarmetîdana doza Kurd û proseya aştî li Bakûr û her wiha hewldana ji bo yekgirtina aliyên Kurdî yê Rojava bilind nîrxand. Serokê Bajarvaniya Agirî daxwaz jî ji Serok Barzanî kir ku hemû aliyek hewl bidin ji bo bestina Kongreya Neteweyî.

Li beranber da Serok Barzanî bi xêrhatina Serokê Bajarvaniya Agirî kir û xweşhaliya xwe jî nîşanda ku doza Kurd bi rêkarên aştîyane li Turkiyê berev pêşve çûye û wê yekê xisterû ku li Turkiyê hengavên baş ji bo vekirin û çareseriya kêşeya Kurd hatiye avêtin. Serok Barzanî di derbarê xebata gelê Kurd balkişand li ser wê yekê ku xeba-

ta çekdarî ya gelê Kurd bi navê bergirîkirina li mayînê û parastina nasnameyê bûye. Niha ku Kurd karî bi



xebat û têkoşîna xwe nasnameya xwe biparêze pêwîste li rêya siyasî û bi sedema aştîyê ve mafên xwe mîsoger bike. Serok Barzanî li dirêjahiya axaftina xwe de tekez li wê yekê kir ku li aştîyê da destkeftên mezintir pêktên û ji bo serxistina aştîyê jî divê hemû aliyek bîhnfireh bînin û divê hevkarîya wan kesa bînin ku derfet ji bo aştîyê dirust dikin. Her wiha nabê derfetê bidîne destê şovenî û faşîstan bo ku li navçeyê da şerê di navbera neteweyan hilbigîrsênin. Li gel ewe jî gelê Kurd tehedayê ji kesek qebûl nake û li beranber zulm û dagîrkariyê da bergiriyê li xwe dike.

Serok Barzanî beranber bi paşaroja gelê Kurd geşbîniya xwe nîşanda û ragihand ku niha gelê Kurd li asta cihanê da nav û dengeke xwe yê gelek baş heye. Kurd her li Kobanê heta Xaneqîn bi îmkaniyata kêr karî beran-

ber terorîstan raweste û wan têkbişkîne. Di derbarê çûna Pêşmerge ya Kobanê de balkişand li ser wê yekê ku


çûna Pêşmerge ya ji bo yarmetîdana Kobanê hesta neteweyî ya Kurdên bilind kir û yekgirtîya Kurdan bihêztir kir û eve jî dîpat kir ku hêza me li yekgirtîya me da ye û eger em bixwazin gelekî serfiraz bînin divê yekbigîrîn. Di derbarê Rojavayê Kurdistanê jî Serok Barzanî ewe ji bo Serokê Bajarvaniya Agirî behs kir ku cografya Rojava û dîrbûna navçeyên Kurdan ji hevdu wiha dixwazê ku hemû hêz û alî li gel hevdu bin. Her di destpêka qeyrana Sûriye me bi Kurdên Rojava re ragihand ku bi pêkve bin û nebîne dû bere û her biryarek ku hun bidin em palpiştîya we dikin. Serok Barzanî eve jî xisterû ku piştî êrişê terorîstan ya li ser Rojava çawa palpiştîya Pêşmerge buyîn wiha jî hevkar û palpiştê Rojava bûyîn.

Li beşekî dinê axaftina xwe de Serok Barzanî tekez li ser pêwîstiya bestina Kongreya Neteweyî kir.

Hisên: Pêwîstiya Pêşmerge bi balafirên Apache heye

BasNews (Navenda Nûçeyan): Berpirsekî pilebilind ê hikûmeta Herêma Kurdistanê aşkere kir ku, hejmara çekdarên DAIŞê bi sedan hezare, ew hejmar jî gelek ji hejmara berî niha ku CIA belav kiribû, bêhtir. Serokê Dîwana Serokatiya Herêma Kurdistanê, Fuad Hisên di hevpeyvîneke rojnamevanî de ragihand ku, hejmara çekdarên DAIŞê nêzikî 200 hezar kese "Ji ber ku ew dikarin xortên Erebbên navçeyên di bin destê wan de rêbixin û tevî xwe bikin." Li gor ku Fuad Hisên daye zanîn, DAIŞê yek li ser sê ji hej-

mara şênîyên Sûriyê û Iraqê kontrol kiriye "Niha êzîk 10 heta 12 milyon kes di bi desthilata DAIŞê de ne, rûbera navçeya wan jî 250 hezar kilometrê çargoşe ye." Derbarê êrişê DAIŞê li ser Herêma Kurdistanê, Hisên wiha got: "DAIŞê li ser bigeha stratejiya tirsê şer dikir, bandora wê yekê jî li ser morala hemû aliyekî hebû, di nav wan de jî Pêşmerge." Serokê Dîwana Serokatiya Herêma Kurdistanê amajr kir ku, ji bo rûbirûbûna çekdarên DAIŞê "Pêwîstiya Pêşmergeyan bi helikopterên Apache û tank û çekên giran heye."



Derbarê azadkirina navçeyên Iraqî yê di bin kontrola çekdarên DAIŞê de, Fuad Hisên da zanîn ku "Hêzên Pêşmerge amade ne alîkariya artêşa Iraqê bike, lê lê ne artêşeke taifî bê.

General Dempsey: Şerê dijî DAIŞ'ê çend salan dirêj dibe

BasNews (Navenda Nûçeyan): Serokeyê Artêşa Amerîkayê General Martin Dempsey piştî serdana xwe ya bo Iraq û Herêma Kurdistanê, ragehand ku Amerîkayê alîkarî da Iraqê û nehişt bikeve. General Dempsey di çarçoveya serdana xwe de ji rayedarên Iraqê re got: "Guhertin bi ser şerê dijî çekdarên DAIŞê de hatiye û hindik maye ev şer bigihe armanca xwe. Niha çekdarên DAIŞê lawaz û bêhêz bûne, lê tê pêşbînî kirin ku ev şer çend salan dirêj bibe." Dempsey wiha axifî: "Çekdarên DAIŞê ne wiha ne wek tê behskirin, lê lawaz û bêhêz in, di rastî de jî îdeolojiyê wan a radikal heye. Herwiha çekdarên DAIŞê tenê bi hewl-



tevahî tirsê terorê li navçeyê were jînavbirin." Hêjayê gotinê ye Serokeyê Artêşa Amerîkayê General Martin Dempsey doh serdana Iraqê kir

û piştî derbasî Hewlêrê bû û ligel Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî û rayedarên Wezareta Pêşmerge û Encûmena Asayîşa Herêma Kurdistanê civiya. Di civînê de General Dempsey got: "Dê Hêzên Hevpeyman li ser piştgirîkirina Hêzên Pêşmerge berdewam bin êdî çî di warê perwerdeyê de be yan warên din. Herwiha dê êrişên esmanî jî bo ser pêgeh û binkeyên DAIŞê berdewam bin." Dempsey, pêşketina wê dawiyê ya Hêzên Pêşmerge bilind nîrxand û got ku rolekî girîng e Pêşmergeyan di şerê dijî terorê hebû û herwiha sersaxî jî li malbatên wan Pêşmergeyan kir ku di şerê dijî terorê de şehîd bûne.

Li Mûsilê bi dehan çekdarên DAIŞ'ê hatin kuştin

Hejar Memûzîni (Mûsil): Ji ber bombardimana balefirên şer ên Hêzên Hevpeyman li nav bajarê Mûsilê 35 çekdarên DAIŞê hatin kuştin. Di hundirê hefteyekê de jî 18 çekdarên DAIŞê ji aliyên grûbên çekdar ên nenas ve hatine kuştin. Derbarê êrişên esmanî de bo ser pêgehên DAIŞê, çavkaniyêke taybet ji Mûsilê agahî dan BasNewsê û got: "Balefirên şer ên Hêzên hevpeyman çekdarên

DAIŞê li navçeya Şergat bombardimand kirin ku dikeve rojavayê Mûsilê û di encam de 35 çekdarên DAIŞê hatin kuştin." Ji aliyekî din ve li gor agahiyên BasNewsê, îro li nav bajarê Mûsilê laşên 3 çekdarên DAIŞê hatin dîtin ku ji aliyê grûbên çekdar ên nenas ve hatine kuştin û êrişên ser çekdarên DAIŞê jî berdewam in. Li gor heman agahiyên di hundirê hefteyekê de li navçeyên cuda yê Mûsilê 18 çekdarên



DAIŞê ji aliyên grûbên din ên çekdar ve hatine kuştin. Êriş jî bi giştî li taxên Xeyl Eden, Mîşraq, Şûra, Hemam Elîl û çend taxên din hatine kirin.

Daxuyaniya civîna serokwezîr û wezîrê nefta hikûmeta Îraqê

Nêçîrvan Barzanî serokwezîrê herêma Kurdistanê, îro roja pêncşemiyê 13.11.2014ê li bajarê Hewlêrê, pêşwazî li Adil Ebdulmehdî wezîrê nefta hikûmeta Îraqê kir. Di civînekê de ku, Qubad Talebanî cîgirê serokwezîrê herêma Kurdistanê amade bû, pirs-girêkên navbera Hewlêr û Bexdayê û bi taybetî dosyeya neftê û pêngavên ji bona çareseriyê wan pirs-girêkan tîn avêtin hatin gotûbêj kirin. Di civînê de, piştî dosyeya neftê bi awayekî dûr û dirêj hatî minaqeşekirin, her du alîyan li ser wê yekê li hev kir ku, çareseriyê gîştî bo pirs-girêkên navbera hikûmeta federala Îraqê û hikûmeta herêma Kurdistanê bê dîtin, û piştî çend civînan, li ser navê her du alîyan daxuyaniyek bi navê; daxuyaniyek ji civîna navbera serokwezîrê herêma Kurdistanê û Adil Ebdulmehdî wezîrê nefta hikûmeta Îraqê derket û li gor wê daxuyaniyê,

weke pêngava yekemîn her du alî li ser van xalên li jêr li hev kir:

1- Hikûmeta federala Îraqê 500



milyon dolaran bi hikûmeta herêma Kurdistanê bide.

2- Hikûmeta herêma Kurdistanê dê rojane 150 hezar bermîlên nefta xam

bixe jêr destê hikûmeta federala Îraqê.

3- Birêz Nêçîrvan Barzanî serokwezîrê herêma Kurdistanê di çen rojên

bên de, ji bona çareserkerina timama pirs-girêkên hilawîstî bi awayekî yeksan û destûrî, dê bi serokatiya şandeyekê serdana Bexdayê bike.

Obama: Dibe ku em hêzên bejayî bişînin Îraqê

Hewlêr (Rûdaw)- Serokê Amerîkayê Barack Obama ragihand ku, eger Serokê Desteya Hêzên Hevbeş a Artêşa Amerîka Martîn Dempsey daxwaz bike, emê hêzên bejayî bişînin Îraqê. Serokê Amerîkayê Barack Obama gotarek di kongireya G20 a 2014 li welatê Awustralyayê pêşkêşkir û di wê gotarê de ragihand: Eger me dît çekên pêsketî ketin destê DAIŞê de, dibe ku em hêzên xwe yê bejayî li Îraqê belav bikin. Obama wiha domand: "Eger Serokê Desteya Hêzên Hevbeş a Artêşa Amerîka Martîn Dempsey daxwaz bike, emê hêzên bejayî bişînin Îraqê."



Lê Serokê Amerîkayê dîsa da zanîn ku, "Ew leşkerên ku amerîkî yê li Îraqê, tenê karê wan perwerdekirin û şewir e ji bo hêzên Îraqê da ku karên xwe bi cih bînin." Derbarê rewşa Sûriyê jî, Barack Obama car din tekez kir ku, Beşar Esed êdî wek Serokê Sûriyê nemaye û ji ber vê Washington mamele ligel wî nake. Obama wiha got: "Beşar Esed li beşek mezin ji Sûriyê bê şerîyet maye, ji bilî wî jî, berpîrs e ji kuştine bi dehan hezar kes. Lewma Amerîka di şerê li Dijî DAIŞê de mamele ligel Esed nake."

Heta vê sibehê şer berdewam dike

Sînore Kobanî (Rûdaw)- Li bajarê Kobanî yê Rojavayê Kurdistanê şerê di navbera hêzên kurdî û çekdarên DAIŞê de berdewam dike û



YPGê dibêje 12 çekdar hatine kuştin û 4 şervanên wan şehîd bûne. Peyamnêrên Rûdawê li nêzik sînore Kobanî ragihandin ku şer û pevçûn heta vê sibehê li taxên başûr û rojhilatê Kobanî berdewam dikin û tevgera balafiran li asmanê Kobanî nesekiniye. Li aliyê din, navenda ragihandina YPGê ragihand: "Di şerê duh li Kobanî de 12 çekdarên DAIŞê ku di nava wan de emîrek jî hebû, hatin kuştin." YPGê aşkere kir ku, di şerê duh de 4 şervanên wan şehîd bûne. YPGê herwiha ragihand ku şervanên wan 5 gundên li rojavayê bajarê Serêkaniyê jî çekdarên DAIŞê rizgar kirine.

Dîroka kevnare di bin avê de dimîne

Piştî avakirina sikra Xêste (ilisu barajî) gelek dever dimînin di bin avê de. Wek tê zanin ji bo Heskif û dîroka kevnare nemînê bin avê de



gelek çalaki hatin kirin. Lê sikir ava dibe demek nêzik piraniya derdora Botanê dimîne di bin avê de. Ji bo derxistina diroka kevnare li herêmê eve 13 salin kolandin tene kirin. Devera ava botan û ava Başûr gelek tiştên kevin hatine dîtin. Ev dîroka 3 hezar sal ji berî zayînê ye. Tiştên derketin rûyê erdê didin nîşandan ku bajarê Sêrtê ji berî 5 hezar salan cihêk girîng yê bazirganiyê bû. Herweha lêkolîner dibêjin wê demê halxweşiya bajarê Sêrtê ji niha baştir bû. Devera ava Dicle û ava Botan digihê hev kelhek mezin hate dîtin. Li gora lêkolînê hatine kirin gelek tişt hatine dîtin ku dîroka kevnare ronî dike. Li gora daxuyaniyên berpîrsên arkelojîk, dem gelek kine û ew lêkolînê xwe nikarin xilas bikin. Mixabin ew dîroka kevnare dê biomîne bin avê de.

Em Seyid Riza û hevalên wî bi granî bi bîr tînin

Seyid Riza, kurê wî û hinek hevalên wî, 77 sal berê di roja 15.11.1937 an de li Elezîzê, li Meydana Genimî hatin darvekirin. Mezelê Seyid Riza jî wek yê Şêx Seîd heta nuha jî hatiye veşartin, kes nizane li kê derê ye. Ewên ku wan kuştin û cîhê mezelên wan weşartî hîştin, gotin qey emê bi vê rêyê doza Kurd û Kurdistanê jî bikujin, ji holê rakin.

Seyid Riza beriya darvekirina xwe, ji dewleta Tirk re digot "ev tiştên ku hûn dikin eyb e, zulme, qetl e". Lê bele vê "eyb û zîlm û qetlîam" ê heta îro jî berde-wam kiriye. Herweha çawa ku wê rojê Seyid Riza li himber vê zilmê serê xwe netewandibe, neviyên wî jî heta îro serê xwe netewandin e. Têkoşîna azadiya Kurd û Kurdistanê bi bedelên giran be jî her berdewam kiriye. Neviyên Seyid Riza, îro li Başûrê Kurdistanê, ji dewleteke federe, ber bi dewleteke ser-

bixwe ve dimeşin. Li Rojavayê Kurdistanê bi yek dil û yek helwestê, temama Kurdên cîhanê berxwedaneke qehremane lidardixin. Li Rojhilatê Kurdistanê, ala azadiyê tu carî neketiye erdê. Neviyên Seyid Riza, li bakurê Kurdistanê, bi xebat û têkoşîneke berdewamî, bi dengê milyonan stranên berxwedanê û azadiyê diqîrin. Ew aqiliyeta dewleta Tirk ya digot "yek millet, yek welat, yek dewlet, yek al" sebebê jenosît û qetlîama Dêrsimê û ya hemû qetlîaman e jî. Mixabin ew aqiliyeta ku duhî ev "eyb, zîlm û qetlî" a pêk anî, îro hîna jî bi awayekî ji dil rêya çareseriyê rasteqîn qebûl nekiriye. Dewleta Tirk jibo Dêrsimê behsa "lêborînê" dike. Lê hîna jî cîhê mezelê Seyid Riza û hevalên wî veşartî ne. Divê dewleta Tirk jibo vê qetlîamê bi her awayî bêdarezanandin. Divê rêya çareseriyê pîrsa Kurd û Kurdistanê bê vekirin.



Têkoşîna azadiya Kurd û Kurdistanê heta îro bi kuştin û qetlîaman nehatiye rawestandî, ji îro pê ve jî dê tu kes nikaribe rê li ber bigire. Em wek PAKê, Seyid Riza, hevalên wî û hemû qurbanîyên jenosîda Dêrsimê bi gramî bi bîr tînin. Ew alaya ku ji destê Seyid Riza neketiye erdê, di destê Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK) û hemû welatperweran de, dê li ser axa Kurdistanê azad de bi serfirazî biheje. Em vê sozê didine hemû şehîdên xwe. 15.11.2014

Mustafa Özçelîk

Rûdaw kanala Mîtê ye yan HDP partiya Mîtê ye?

Tora Medyayî ya Rûdawê her ji destpêkê ve û heta niha bi awayeke eşkere xwest li ser berjewendiya gelê Kurd zan-



yariyên nû yê cîhanê pêşkêşî gelê Kurdistanê û her Kurdekî li cîhanê bike. Tora Medyayî ya Rûdawê her ji destpêkê ve û heta niha bi awayeke eşkere xwest li ser berjewendiya gelê Kurd zanyariyên nû yê cîhanê pêşkêşî gelê Kurdistanê û her Kurdekî li cîhanê bike. Helbet li vê armanca xwe ya giran û qûrs de barê Rûdawê ne sivike û birastî jî ne hêsane ku şaşî an jî xeletiyên neke. Helbet şaşî û kêmasiyên Rûdawê jî çêbûn, lê belê bi awayeke gîştî birastî jî Rûdaw berev serkeftin û pêsketî ve diçe. Li bin yek sêwanekî de komkirina rojnamevanên Kurdên Bakûr, Başûr, Rojhilat û Rojava bi serê xwe serkeftineke mezine. Lê belê

pêkve xebitandina van Kurdan jî birastî zehmete. Ji ber ku Kurdên her perçeyê Kurdistanê têra xwe ji asimilasyona dewletên dagîrker kirêt bûne û li bin kultura wan de mezin bûne û paqijkirina wan jî demêke dirêj dixwaze û paqijkirina wan jî ne hêsane. Lê belê dawîya dawî de eger xebatkarên Rûdawê bikaribin xwe ji qirêjiya bîr û baweriyên dewletên dagîrker xelas bikin wê demê wê rojnamevanên 24 eyarê zêrê zer û Kurdên paqij û Kurdperwer derkeve holê ku xwe ji tu milleteke din kêmtir nebîne.

Rûdaw birastî jî şoreşê rojnamevaniyê pêkanî, li bin yek sêwanê de komkirina rojnamevanên Kurd, di demêke zû de pêşkêşkirina zanyariyan, cîhdana her ramanêke cûda û pêxistina demokrasîya Kurdan û bikaranîna teknolojiya nûjen asta rojnamevaniya Kurdistanê û Kurdî gelek bilind kir, eve jî beşek ji şoreşê Tora Medyayî ya Rûdawê ne. Heta niha ew êrîşên ku li ser Rûdawê hatine kirin, ji aliyê wan kes û grûban ve hatine kirin ku ne demokrasîyê dizanin û ne jî tehemmula ramanêke cûda û pêkve jîyanê dikin. Ew

kes û alî gelek bi eşkere diyarin û navê demokrasîyê li devê xwe de kirine benîşt û dicûn, lê belê mixabin nizanin demokrasî çîye û tehemmula wan ji demokrasî jî tûne û ew ji wan dîktatorane ku êdî cîhanê de hejmara wan roj bi roj kêmtir dibe û civaka Kurdan jî êdî baş dizane ku ew çend paşmayî û aqil-sivîkin. Rûdaw kanala Mîtê ye yan HDP partiya Mîtê ye? Bi tometa Rûdaw kanala Mîtê ye êrîşî rojnamevanên wê kirin. Helbet eşkereye ku kî Rûdawê damezrandiye û li ser berjewendiya çî milletekî kar dike û zanyariyên nû pêşkêşî çî milletekî dike. Lê belê HDP jî baş diyare ku li ser biryara kî hatiye damezrandin ku hemû kes dizane bi biryara Mîtê û bi gotina Ocelan û bi kiriyara Sirrî Sureyya Onder hatiye damezrandin. HDP ne naveke Kurdî ye, ne Serokê wê Kurdî dizane û ne jî li ser berjewendiya Kurd û Kurdistanê kar dike. Armanca wê xapandina gelê Kurdên Bakûrê ku Kurd daxwaza axa welatê xwe nekin û wan bi biratiya gelan bixapînin. Eve jî diyare li ser berjewendiya Mîtê ye û HDP ya Mîtê.

Exmîrê Sêrtî

CIA dê hêzên dijberiya Sûriyê perwerde bike

Hewlêr (Rûdaw)- Ajansa Îxtisbarata Amerîkayê (CIA) wê serpereştiya çekdarkirin û perwerdekirina hêzên lîbral ên dijberiya Sûriyê bike.

Hat gotin ku CIA niha nêzikî 400 şervanên dijberiya lîbral ya Sûriyê perwerde dike û di dema pêş de wê ev hejmar zêdetir bibe. Biryar e Cîgirê Serokê Amerîkayê Coe Biden jî heftiya bê serdana Tirkîyeyê bike û derbarê plana avakirina herêmeke



tampon de ligel Serokomarê Tirkîyeyê Recep Teyyip Erdogan gotûbêjan bike. Herwiha hat ragihandin ku fermanîdarên leşkerî yê Amerîka û Tirkîyeyê pilanek danîne ji bo perwerekirina 2 hezar şervanên dijberiya Sûriyê ya lîbral li ser axa Tirkîyeyê. Li gor zanyariyên ku hatine belavkirin, wê perwerdekirina hêzên lîbral ên dijberiya Sûriyê li Tirkîyeyê di meha bê de destpê bike.

Serok Barzanî û Serokê Artêşa Amerika şerê Daişê nixandî

Êvriya îro şemî 15.11.2014 li bajarê Hewlêrê birêz Mesûd Barzanî Serokê Herêma Kurdistanê pêşwaziya General Martin Dempsey Serokê Desteya Erkanî ya Hevbeşa Artêşa Amerîka û şandekî li gel kir ku ji Stewart Jonz Balyozê Amerîka li Iraqê û ji hejmarek pîledar û şewirmendên siyasî û serbazî yên artêşa Amerîkayê pêkhatibûn. Êvriya îro şemî 15.11.2014 li bajarê Hewlêrê birêz Mesûd Barzanî Serokê Herêma Kurdistanê pêşwaziya General Martin Dempsey Serokê Desteya Erkanî ya Hevbeşa Artêşa Amerîka û şandekî li gel kir ku ji Stewart Jonz Balyozê Amerîka li Iraqê û ji hejmarek pîledar û şewirmendên siyasî û serbazî yên artêşa Amerîkayê pêkhatibûn.

Li civînê de ku Mesrur Barzanî Şewirmendê Encûmena Asayîşa Herêma Kurdistanê û Mistefa Seyîd Qadir Wezîrê Pêşmerge û Kerîm Şengalî Wezîrê Navxo û Ferîq Şerwan û Cebare Yawer Endamên Fermandeya Giştî ya Hêzên Parastina Herêma Kurdistanê amade bûn, Serokê Desteya Erkanî ya Hevbeşa Artêşa

Amerîka ji bo rexsandina vê hevdîtîne spasiya Serok Barzanî



kir û xweşaliya xwe ji bi wê yekê nîşanda ku hemahengiya di navbera Pêşmerge û hêzên hevpeymanan bi başî birêve diçe û tekez ji li wê yekê kir ku hêzên hevpeymanan berdewam dibin li palpiştîkirina Pêşmerge û meşqêkirina wan û her wiha weşandina gurzê asmanî li terorîstan li her cîhek ku pêwîst bike. Serokê Desteya Erkanî ya Hevbeşa Artêşa Amerîka serkeftinê ve dawiyê ya hêzên Pêşmerge bilind nixand û pêzanînen xwe ji bo rola Pêşmerge li şerê dijî terorê da

hebû û serxweşiyê ji li malbat û kesukarên wan Pêşmergeyan

kir ku li şerê terorîstan da şehîd bûne û canê xwe gorî kirine. Li beşekî dinê axaftina xwe de Serokê Desteya Erkanî ya Hevbeşa Artêşa Amerîka wê yekê dîpatkir ku welatê wan û hêzên hevpeymanan li şerê dijî Da'îş da piştî xwe bi stratejiyekî hemû aliyanê ya rûn dibestê. Serokê Desteya Erkanî ya Hevbeşa Artêşa Amerîka ragihand ku armanca serdana wan ya Hewlêrê ji nêzîk ve agahdarbûne ji rewşa meydanî û her wiha guhertîna li pêşniyar û şîret û nêrînen Serok Barzanî

yên di derbarê çawayiya berde-wambûna lêdan û ji navbirina terorîstên Da'îş. Her wiha eve ji bi Serok Barzanî ragihand ku hêzên hevpeymanan hemû têbîniyên Herêma Kurdistanê û pêdiviyên Pêşmerge bi ciddî werdigirin û kar ji bo dabînkirina wan dikin. Li beramber da Serok Barzanî bi germî bi xêrhatina General Martin Dempsey û şanda li gel kir û spas û pêzanînen xwe ji bi bo palpiştî û rola Amerîka û hevpeymanan dîpatkir ku hevkarîyên wan li şerê dijî Da'îş de bi bandor û karîger bûye. Serok Barzanî li gotarek da bi hurî tîşk xiste li ser rewşa meydanî ya bereyên rûbirûbûna terorîstan û behsa çawayiya têkşikandina terorîstên Da'îş li ser destê hêzên Pêşmerge kir û balkişand li ser wê yekê ku ji bilî wê yekê ku hêzên Pêşmerge abluqe li ser bû, bi îmkaniyatekî kêrî karî êrîşa rêxistineke terorîstî rabigrê ku çekên pêşkêfî û îmkaniyata dû dewletan ketibû destê wan. Serok Barzanî eve ji xisterû ku hêzên Pêşmerge gelek bi lez karîna êrîşa Da'îş rabigrin û ew bi xwe bikevê helwêsta êrîşbirinê û li gelek cîhan wan têkbişkinin.

Serok Barzanî eve ji dîpat kir ku hemû qurbanîyek didin bo ku terorîstan ji welatê xwe derbixin û her bostekî axa Kurdistanê ji çengê terorîstan azad dikin. Li dirêjahiya axaftina xwe de Serok Barzanî balkişand li ser wê yekê ku şerê terorê tenê ne rehenda serbazî ye belku pêwîste li ruyê fikrî û siyasî û aborî ve ji rûbiruyê wan bibîn. Eve ji bi pêwîst zanî ku tu penagehek nabê li Iraq û Sûriye û tu cîheke din ji bo terorîstan bimîne. Serok Barzanî destxweşiyê ji li hêzên Pêşmerge û hêzên hevpeymanan kir ku heta niha bi tenê yek cîheke medenî ji nekirine armanc û hemahengî û êrîşan bi plana rêkûpêk birêve diçe.

Her li vê kombûnê de çawayiya hemahengiya di navbera hêzên Pêşmerge û hêzên Iraqê xistin ber behs û her dû alî dîpat kirin ku pêwîste Bexda li yarmetîdana hêzên Pêşmerge de ciddî bê û erk û pabendbûnen xwe bi cîh bike. Li beşekî dinê vê civînê de di derbarê rewşa Kobanê û cûna Pêşmerge ya Kobanê hate axaftin û her dû alî tekez li ser parastina Kobanê û palpiştîkirina wan hêzên Pêşmerge kir ku niha li Kobanê beşdarî şerê dijî Da'îşê ne.

Huseyin Çelik damezerê AK-Paartiyê, wezîrê perwerdê yê berê û cigirê serokê AK-Partiyê yê kevin. Piştî Receb Erdogan bû serokkomar Huseyin Çelik ji wek endamê partiye ma.

Di derbarê rewşa Çelîkte gelek gotin hatin kirin, heta nûçeyên ku de Çelik ji Ak-Partiyê veqete derketin. Kanala televizyona 24ê de Huseyin Çelik di derbarê pêvajoyê de û herweha di derbarê gelek tiştên

Tiştî ku salên 90î de dewleta kûr dikira niha PKK dike

ku rojana tene gotubêj kirin dîtînen xwe gotin. Di derbarê "Pêvajoya Çareseriyê" de Çelik got. Di qonaxa pêvajoyê de, ji ber hinek bûyeran metirsiyên me çêbûn. Eger PKK rêya bigre û kontrolê bike, êrîşê karkerên rêya çêdikin bike, zarokên rake çiya, li gora xwe hinek dadgehan deynê û xelkê tehdît bike ev yek bala her par-

lementerê AK-Partiyê dikişîne.

Tiştî ku salên 90î de dewleta



kûr dikira niha PKK dike.

Madeya yekem ya pêvajoyê ew bu ku de çek neyên karanin û çekdarên PKKê ji sinorê Tirkîye derkevin. Lê PKKê ev nekir. Pêwîste mihaseba ve bête kirin. Huseyin Çelik berde-wambûna axaftina xwe de got: Qonaxa pêvajoyê de bûyerên 6.7ê meha 10ê çêbûn. Başê qonaxa pêvajoyê heye lê, li Bin-

golê Polis tene kuştin, li Geverê 3 leşker hatin kuştin, li Diyarbakir efserek hate şehid-kirin.. Piştî Demirtaş radibe dibêje : Me nedixwest ev bûyer çêbibin, em li dijî şidetene.

Hinge kesek baweriyê li we nayne. Îdia kirin ku hukûmet dixwaze li Kobanê kurd bimirin. Ev ne tiştên cidîne. kesek îtibare li we nake. Min dema ev bûyer û tundî dît wek kurdekî ji xwe fedî kir.

Êzîdî saxî û selametiya Tirkîyê dixwazin

Êzîdiyên Şengalê ku ji ber zulma DAIŞê reviyane û li hinek ji bajarên Bakûrê Kurdistanê bûne mîhvan, bi şandekî 15 kesî li gel Recep Tayîp Erdogan Serok Komarê Tirkîyê hevdîtinek pêkanîn û piştî hevdîtîne bûne mîhvanê TRT6 û bersîva pirsîyarên rojnamevanan dan.

Êzîdiyên Şengalê ku ji ber zulma DAIŞê reviyane û li hinek ji bajarên Bakûrê Kurdistanê

bûne mîhvan, bi şandekî 15 kesî li gel Recep Tayîp Erdogan Serok Komarê Tirkîyê hevdîtinek pêkanîn û piştî hevdîtîne bûne mîhvanê TRT6 û bersîva pirsîyarên rojnamevanan dan.

Li ser navê Êzîdiyên li Tirkîyê Dawîd Mûrad Qerî û Pakîze Îsmail pirsên TRT 6 ê bersîvandin. Di destpêkê de behsa rewşa Êzîdîyan bi giştî kirin û paşê ji behsa Êzîdiyên li Tirkîyê

kirin û dane zanîn ku gelek jin û keçên Êzîdîyan di destê DAIŞ a dirinde de wekî dîl û êsîr mane. û DAIŞ van keçên di destên xwe de li bazaran de wekî koleyan difroşe. Dawîd Mûrad Qerî ragihand ku wan ji Erdogan û ji Tirkîyê xwestiya ku alîkarî bikin ku demeke nêzîk de keç û jinên wan bîne azad kirin. Li ser pîrsekî rojnamevanê TRT 6 gelo Êzîdî ji gelê Tirkîye û ji Recep



Tayîp Erdogan çî dixwazin? Pakîze Îsmail ku wekî nûnerekî jinên Êzîdî beşdarî bernameya

televîzyonê bûbû got: Em tiştêk naxwazin û saxî û selametiya we û gelê Tirkîyê dixwazin.

Wezareta Pêşmerge: Tu Pêşmergeyek li Kobanê bijehrî neketiye

Hoşmend Sadiq (BasNews): Wezareta Pêşmerge gotegotên ku behsha bijehrîbûna hejmarek Pêşmereyên Kurdistanê li Kobanê red kir û ragihand ku "Ew gotegot dîrî rastiyê ne." Duh, Şemiyê, nûçeyek belavbû ku 80 Pêşmergeyên Kurdistanê li bajarê Kobanê yê Rojavayê Kurdistanê bijehrîbûne, di vê derbarê de Sekreterê Giştî yê Wezareta Pêşmerge Cebare Yawir di daxuyaniyekê de ji BasNewsê ew gotegot red kirin û bi derû ji rastiyê dan zanîn. Cebare Yawir li ser wan gotegotan wiha got: "Ti kesek ji wan her 151 Pêşmereyên li Kobanê bijehrî neketine, ew tiştê ku hatiye belavkirin ji dîrî rastiyê ye." Yawir diyar kir ku, piştî belavbûna wê nûçeyê wan peywendî bi fermandeyê Hêzên Pêşmerge li Kobanê re kirin û wî "Ew nûçe ji red kir, lê diyar kir ku tenê 3 Pêşmerge ji ber sermayê bo nexweşxaneyê hatin veguheştin, ku

bi nexweşiya zikêşê ketibûn." Li gor emîndarê giştî yê Wezareta Pêşmerge "Pizîşkên Pêşmerge li Kobanê



ragihandin ku ti Pêşmergeyek bi sedem şerhîbûnê ji bo nexweşxaneyê nehatine şanidin."

Di dawîya meha bûrî de, li ser fermana Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî, hêzeke 151 kesî ji Pêşmergeyên Kurdistanê bo pişgiriya şervanên Kurd li Kobanê di şerê li dijî çekdarên DAIŞê de, bo wî bajarî hatin şandin û niha karîne hevsengiya hêzê di berjewendîya şervanên Kurd de li Kobanê biguherin.

Zanyariyên dawî li ser rewşa meydanî û mirovî ya Kobanê

Çekdarên DAIŞê êrîşên xwe li ser bajarê Kobanê diwartir dikin da ku pêgehên ku ji dest wan hatine derxistin carek din kontrol bikin, hevserokê Kantona Kobanê jî dibêje ku şervanên Kurd di pêşengiyê de ne. Di her 24 demjimêrên bûrî de, çekdarên rêxistina Dewleta Islâmî ya radîkal, ku bi navê DAIŞê tê naskirin, êrîşên xwe li ser bajarê Kobanê yê Rojavayê Kurdistanê diwartir kirine, da ku wan pêgehên şervanên Kurd rizgar kirine, carek din kontrol bikin. Peymanêrê BasNewsê ji bajarê Kobanê ragihand ku, îro, 16ê Mijdarê, çekdarên DAIŞ deriyê sînorî yê Murşîtpînarê bi Hawenan topbaran kirin, da ji bin destê şervanên Kurd derbixin, lê şervanan bi piştigiriya Hêzên Pêşmergeyên Kurdistanê karîne di rûyê wan êrîşên çekdaran rawestînin. Ji aliyek din ve, şer û pevçûnên giran di navbera şervanên Kurd û çekdarên DAIŞê de li başûr û rojhilatê Kobanê qewimîn. Li taxa Kaniya Ereban, Bazara Şinkayî li rojhilatê bajêr û derdora avahiya Şaredariya Kobanê li navenda bajar şervanên Kurd bi piştigirî û piştevaniya Hêzên Pêşmerge êrîşên tund birine

ser çekdaran. Hevserokê Desteya Cîbicîkar a Kantona Kobanê, Enwer Mislim di daxuyaniyeke taybet de ji BasNewsê re ragihan ku "Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jinê (YPJ) bi piştigiriya Hêzên Pêşmerge û bombebarana balafirên hevpeymanan, bi berdewamî pêşde diçin û di şer de ew di pêşengiyê de ne." Enwer Mislim amaje kir ji ku, pêwîstiya şervanên Kurd bi alîkariyên leşkerî heye, tevî berdewambûna operasyonên ezmanî li dijî pêgehên çekdarên DAIŞê, ji ber ku rêxistina navbûrî çekên giran û kesên xwekuj bi berdewamî tîne ji ber şerê Kobanê, li gor gotina Mislim. Mislim daxwaz ji civaka navdewletî kir ku alîkar be ji bo vekirine korîdoreke mirovî li Kobanê kir "Ji ber ku kesên sivil ên d nava bajêr de jiyanek dijwar derbas dikin, ji ber êrîşên çekdarên DAIŞê." Li gundê Tehtik û Bozik jî, li başûrê rojhilatê Kobanê, şervanên Kurd karîna otombîleke çekdarên DAIŞê tîk bibin, ji şevê din û heta îro ve, herî kêr 20 çekdarên rêxistina navbûrî hatine kuştin, li gor Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan.





Di salên 1915-1925an de, buhiştî Husên Hiznî Mukiryanî çapxaneyek ji Almaniya anî Helebê û pê çend kovar û rojname weşandin.. Ta ku di sala 1925an

Rola Oldar û Dengbêjan di Parastina Zimanê Kurdî de li Cizîrê

de ji Helebê barkir û çû Rewandîzê..

Belê akam û bandora yekem a gelêrî di parastina zimanê Kurdî de, bi saya dîwana Melayê Cizîrî bû, Mem û Zîna Mele Ehmedê Xanî bû, helbestên Feqeyê Teyran bû û bi saya hicrik û tekiyên olî bû.. Ewên ku, di wî heyamî de, di gund, bajar û bajarokên Cizîrê de belav bûn wek: Xizna, Til Merûf, Hilwa, Endîwerê, Qeremanê, Amûdê û Qamişlo... Hem jî rol û akama dengbêjan, di parastina zimanê Kurdî de pir mezin bû wek: Ûsivkê Çelebî, Silo Koro, Omerê Kor,

Demir Elî, mala Şêxê Nado, mala Emînê Temo, mala Kinê, mala Remo, mala Eliyê Mehmed, mala Şêxê Nado... Û wiha tev malbatên ku bi kemaçe an ribabê û def û zîrnê govend û şahî di Cizîrê de digerlandin ji Eyndîwerê ta bi Serê Kaniyê û tev dengbêjên kilaşîk li devera Cizîrê. Hem jî rola dengbêjên çiyayê Şingalê li ser dengbêjên Cizîrê gelekî xurt bû, ji ber ku hingî Şingal wek dibistanekê, ji fêrbûna saz, awaz û gotina strana kurdî a resen re dihat dîtin...

Piştî vî nîfşî, nîfşekî din ji dengbêjan

hat meydanê, ew jî ne kêmi nîfşê pêşîya xwe bû; wî jî roleke giring di parastin, pêşxistin û berdwamiya parastina zimanê kurdî de lîstiyê wek: Hizniyê Selîm, Rifetê Darî, Evdilo, Aramê Dîkran, Seîd Yûsif, Mehmûd Ezîz, Mihemed Şêxo.. û gelekên din ku peyva Kurdî ya resen di nav tîlên tembûr û dengê xwe de parastine... Û wiha millet bi zimanê xwe ve girêdayî maye ta roja îro.. Rehma Xwedê li miriyan be ji wan û temenekî dirêjdî xweşiyê de ji saxan re be. Wêne: Ez û hunermend Saîd Yûsiv di xelata şahiya min de sala 1978an li Qamişlo.

Konê Reş

Qamişlo, 13.11.2014

Serdana Gora Mîrê Mîr Bedirxan li Şamê

(Mîro! Eger welatîyên we di nav xwe de li yekîtiyeke pîroz ne gerin wê kî ji wan re lê bigere?!)

Rêzdarê hêja, xanima delal Solîn Hacador!

Ez ji dil û can van gotinên xwe ji cenabê te re pêşkêş dikim û her wiha spasiya wan gotinên te yên xweş derbarî min dikim û dibêjim; Bi hêvî me ku ez karibim wiha li gor dilê te û dilsoz û wefadarên gelê Kurd berdwam bikim.. Ez jî vê serdana xwe a ser gora mîrê Cizîra Botan Mîr Bedirxan û herdû neviyên wî Mîr Celadet û Rewşen xanim diyarî cenabê te dikim.

Li Şamê di quntara çiyayê Qasiyon de gora mîrê Cizîra Botan mîr (Bedirxanê Azîzî: 1802 - 1868) di bin xanîkî de di rex

gora Şêx Xalidê Neqîşbendî de bi cih dibê Di eynê gorê de neviyê wî mîr Celadet Bedirxan pêre gorê parvedikê Di wî xanîkî de di rex gora wan de gora Rewşen Xanim Bedirxan e. Di serdane-kê de ji van herdu goran re ev çend gotin bi hêsrên pênuşa min hatin rêz kirin:

Erê erê Mîrekên Botan!

Eger îro hîn di vî xanîkê ser çiyayê Qasiyon de nivistîne bê his û deng raketîne bê guman; hûn di bîr û bawerîya gelê Kurd de zindî ne... tevî ku ji mêj ve morîka xewê avêtiya ser çavên we lê wek ku hûn ne mirîne, hêjî hûn ji gelê Kurd re xwedî ne.. Mêzekî mîzekî!

Bê çawa welatîyên we, xwe li dor gora we dane hev û civîne, Qasiyon ji xwe re kirine çiyayê (Cûdî) û (Herekolê Azîzan) ta di mirinê de jî, çavê wan li we ye û bi hêvîne ku di bin siya dilsoziya wede buhiştê ji xwe re pêk bînin! Mîrekên Botan! Tevî ku hûn ne di gorên gernas û mîran de hatine veşartin, dûrî Cizîrî Xanî û Memê Alan hatine raketin, hîm û latên (Birca Belek) di nav ava (Dicle) de hatine binavkirin.. Va îro, gora we, di nav xaka biyaniyan de wek qublegehekê lê tê mîzandin...

Mîrekên Botan!

Eger welatîyên we di nav xwe de li yekîtiyeke pîroz ne gerin wê kî ji wan re lê bigere?! Eger li zimanê dê û bavê xwe bixwedî dernekevin wê kî ji wan re lê bi xwedî derkeve?! Eger di cejiş Newroz û sersalan de gurzên gula li ber serê we daneyîn in?! wê kî deyne wê kî deyne..??



Konê Reş

Hevpeyvînek bi serokê Kantona Kobanî re

Hevserokê Kantona Kobanê Enwer Muslim diyar kir ku ev du sal in berxwedêrên YPG û YPJ'ê ji bo nîrx û sembolên hevpar ên mirovahiyê li ber xwe didin û got: "Li Kobanê hezkirina mirovahiyê, berxwedan û welatparêziyê bi ser ket. Kobanê bû keheha berxwedanê ya sedsala 21'êmin." Êrîşên çeteyên DAIŞ'ê yên li dijî Kobanê kete meha duwemîn û berxwedana bêhempa ya li hemberî êrîşên çeteyên DAIŞ'ê berdwam dike. Hevserokê Kantona Kobanê ku ji bo beşdarbûna konferansê çûbû Hewlêrê, ji bo careke din vegere Kobanê hate navçeya Pirsûsa Rihayê. Muslim li vir jî ajansa me re axivî û diyar kir ku ev berxwedana Kobanê bûye malê hemû mirovahiyê. Muslim diyar kir ku Kobanê bûye sembola berxwedanê û da zanîn ku çeteyên DAIŞ'ê xwestin bi çekên giran Kobanê dagir bikin û ji her çar aliyên ve êrîşî Kobanê bikin. Muslim diyar kir ku ev êrîşên çeteyên DAIŞ'ê rastî berxwedan û qehremaniyeke bêhempa tê. Muslim destnîşan kir ku xort û keçên 18-19 salî bi çekên xwe yên sivîk ve li dijî tank û topan li ber xwe didin. Muslim got: "Berxwedana me ji bo mirovahiya cihanê bûye sembol. Her kesên ku xwestin bibin parçeyek ji vê berxwedana bêhempa, hatin Kobanê. Ev berxwedana ku bû sembol, nehiştin DAIŞ bigihe navenda bajêr. Xwestin nêzî 20 êrîşên bombeyî yên bi wesayîtan pêk bînin, lê tu encamek negirtin. Bi

armanca tirsandina sivîlan êrîşên bi hewanan pêk anîn, lê ew jî tu encam negirtin. Li Kobanê hezkirina mirovahiyê, berxwedan û welatparêziyê bi ser ket. Kobanê bû keheha berxwedanê ya sedsala 21'êmin."

DIXWAZIN VÎNA JI BO JIYANA AZAD A BI HEV RE YA MIROVAHIYÊ BIŞKÎNIN

Muslim da zanîn ku Kobanê ji bo parastina gelan, wekhevî û azadiyê ciheke girîng bû û kantona Kobanê ji bo gelan hêvî ye û da zanîn ku ji ber vê jî çeteyên DAIŞ'ê Kantona Kobanê kir hedef. Muslim got: "Em ji bo pêşeroja Sûriyeyê mînak bûn. Hemû gel, feraset, renk dikarin xwe bi awayekî demokratîk bi rê ve bibin û li gorî mafên xwe yên sereke bijîn. Ev hêzên tarî yên li dijî jiyana azad û wekhev a gelan, êrîş kirin û Kobanê kirin hedef. Yên ku Sûriyeyeke demokratîk naxwazin destek dan çeteyên DAIŞ'ê. Pêngava Şoreşa 19'ê Tîrmehê, ji bo Sûriyeyeke demokratîk bû pêşeng. Armanca van êrîşan jiholêrakirina jiyana demokratîk, wekhev, azad û bi hev re ya li ku li Kobanê şîn dibû. Li hêviya ketina Kobanê bûn. Bernameya xwe çekiribûn. Ji ber vê jî dixwazin li Kobanê vîna ji bo jiyana azad a mirovahiyê bişkînin."

EM MIROVAHIYÊ ESAS DIGIRIN

Muslim bi bîr xist ku rejîma BAAS ji bilî Ereban hebûna hemû gelên din ên Sûriyeyê înkâr dike û ev şîrove kir: "Me

têkoşîna xwe ya ji bo wekhevî û azadiya gelan beriya şoreşê jî dabû destpêkirin. Ji me re dibêjin ku tîkiliyên we bi rejîmê re hene. Ev bêbextî ye. Me deriyê xwe ji



leşkerên rejîmê yên ku ji ber çeteyên DAIŞ'ê revîyan û hatin gel me vekir û me ji bo şervanên AAS yên ji ber êrîşên rejîmê hatin vekir. Ji ber ku em mirovahiyê esas digirin. Têkoşîna me ji bo jiyana wekhev, azad û bi hev re ya gelan e. Ji ber vê jî em tîkiliyê bi rejîmek ku hebûna gelan înkâr dike re nadeynin. Em çekan tenê ji bo parastina xwe bi kar tînin."

'HER KES RÊZÊ NÎŞAN DIDE'

Muslimê ku bi xwe di berxwedana Kobanê de cih girt û heta gelek caran di çeperên eniya şer de jî cih girt got: "Bi saya şehîdên me em gihîştin vê rojê. Berxwedana qehreman û lehengên me bû malê hemû mirovahiyê. Ciwanên me yên 18-19 salî ji bo parastina ax û azadiya xwe sond xwarin. Berxwedana jiyane û jiyandî nîşan dan. Her berxwedêrek me

destanek e. Bûn pêşeroja Sûriyeyeke demokratîk. Bûn lehengên azadî, wekhevî û evîna welat. Çalakiyên ku DAIŞ'ê qet hêvî nedikir pêk anîn. Amerîkayî jî neçar man ku rêzê nîşanî vê berxwedanê bidin û destekê bidin berxwedanê. Şehîdên me wisa kirin ku her kes rêzê nîşanî berxwedanê didin. Em vê yekê hemû deyndarê şehîdên xwe ne. Wan serê me her tim bilind kirin."

EM JI BO TIRKIYÊ NE TEHDÎD IN

Enwer Muslim diyar kir ku bi hezaran sivilên li Kobanê dest ji cih û warê xwe bernedane û vegeriyan Kobanê. Muslim got: "Bi hezaran sivil li ser sînor radiwestin. DAIŞ'ê xwest komkujîyek pêk bîne. Rexneyên me ji bo nêzîkatiya dewleta Tirk a li hemberî me heye. Me bi awayekî fermî daxwaza alîkariya ji bo sivil û YPG'ê kir. Me got, ger Kobanê bikeve wê Tirkiye jî bi tehdîdan re rû bi rû bimîne. Tirkiyeyê polisên xwe yên li ser xeta sînor a Til Ebyad û Ezazê nehişt. Lê li ser xeta sînor a cîranê me tijî ne. Divê sivilên li Kobanê dijîn bibîne û destekê bide."

'ME DAXWAZA HÊZA PÊŞMERGE KIR'

Muslim bal kişand ser beşdarbûna Burhan El Firat a ji bo berxwedana Kobanê û berxwedêrên li Kobanê jiyana ji xwest dan û diyar kir ku wê hemû hêzên ku dixwazin Sûriyeyeke demokratîk pêk bê, bi hev re tevbigerin. Muslim tîkildarî bombabaranan hêzên Koalîsyonê jî wiha xivî: "Bêyi berxwedana YPG û YPJ'ê êrîşên

hewayî yên hêzên koalîsyonê tu encam bi dest nedixist. Hêzên koalîsyonê li bajarê Hit ê Iraqê êrîşên hewayî pêk anîn, lê ti encamek bi dest nexistin û ev bajar ket. Ji ber ku li erdê tu berxwedanek tune bû. Ji ber wê jî êrîşên hewayî yên koalîsyonê û berxwedana YPG/YPJ'ê bi hev re encam digirin." Muslim bal kişand ser hatina hêzên pêşmerge ji bo Kobanê û got: "Me ji Hikûmeta Başûrê Kurdistanê daxwaza hatina Pêşmergeyan kir. Hin dibêjin ku me nedixwest Pêşmerge bîn. Armanca van gotinan ew e ku zîyanê bidin yekîtiya navbera Kurdan" û spasiya hêzên Pêşmerge û Koalîsyonê kir.

LI KOBANÊ MIROVAHÎ BI SER KET

Muslim bal kişand ser serdana li Hewlêrê û diyar kir ku hevdîtin bi awayekî erênî derbas bûn û wiha axivî "Em tevî konferanseke navneteweyî bûn. Konferans bi sernavên Rola Kurdan li Rojhilata Navîn, Berxwedana Kobanê û êrîşên çeteyên DAIŞ'ê pêk hat. Me hevdîtin bi hemû aliyên Kurdistanî û heyetan re pêk anîn. Hemû jî baş derbas bûn. Soza piştigirîya ji bo Kobanê dane me. Ji bo kongreya neteweyî û fermandariya hevpar a leşkerî hemû hêzên Kurdistanî weke hev difikirin." Muslim got: "Kurdên çar parçeyên Kurdistanê xwîna xwe li Kobanê rijandin. Li Kurdan ruhê yekîtiyê pêş ket û pirsgrêk bû pirsgrêke navneteweyî. Li Kobanê mirovahî bi ser ket." **ANF**

Erebên tevî DAIŞê bûne nizanin kûve birevin

Fermendarekî Hêzên Pêşmerge li sînorê nahiyya Zûmarê ragihand ku, çekdarên DAIŞê li sînorê Zûmarê ji tîrsa Hêzên Pêşmerge navenda Keskê ya leşkerî teqandine. Fermendarê Hêzên Pêşmerge li sînorê

nahiyya Zûmarê Ehmed Sûrçî ji KDP.info re ragihand: "Vê êvarê terorîstên DAIŞê li sînorê nahiyya Zûmarê dest kirin bi teqandina avahiyên nav navenda Keskê ya leşkerî, ji ber ku ji Hêzên Pêşmerge ditirsin ku êrîş

bikin ser wan û wê navendê ji wan bistînin û qezencê jê bike." Zûmarê Ehmed Sûrçî wiha domand: "Ji êvarê ve çendîn avahiyên wê navendê tîk birine, ku tenê cihên xwe hiştine û neteqandine." Wî fermendarê Hêzên Pêşmerge wiha got: "Ew erebên ku tevî DAIŞê bûne çekê xwe



davêjin û direvin." Hêjayî gotinê ye, nahiyya Zûmarê di êrîşekê

de ji terorîstên DAIŞê hat rizgarkirin û bi temamî ket destê Hêzên Pêşmerge û niha moralê çekdarên DAIŞê li wê deverê bi temamî tîkçûye û dibe ku di demeke nêzîk de ew dever bi temamî di êrîşeke berfireh de ji aliye Hêzên Pêşmerge ve bê kontrolkirin. **rojevakurd.com**

Kürd parti ve örgütler Ulusal Kongre'nin toplanmasını istedi

BasNews(Erbil) - Erbil'de toplanan Kürdistan'ın dört parçasından 66 parti ve örgüt temsilcisi Ulusal Kongre'nin yeniden toplanmasını önerdi. Kürdistan Ulusal Kongresi Hazırlık Komitesi Üyesi Gafur Maxmuri, 66 Kürd parti ve örgüt temsilcisinin Ulusal Kongre'nin yeniden toplanmasını önerdiğini söyledi.

BasNews'e konuşan Kürdistan Ulusal Birlik Demokrat Partisi (YNDK)

Genel Sekreteri ve Ulusal Kürt Kongresi Hazırlık Komisyonu Üyesi Gafur Maxmuri, Kürdistan'ın dört parçasından 66 parti ve örgüt temsilcisinin Rojava gündemi ile Erbil'de bir araya geldiğini belirtti. Maxmuri, Kürdistan Demokrat Parti (PDK) Erbil Örgütlenme Bürosu'nda gerçekleştirilen toplantıda Rojava'daki durumun yanı sıra ulusal etkinliklerde Kürdistan Bayağı'nın yer alması ile

parti ve örgütlerin ulusal konulardaki siyaseti üzerine görüşüldüğünü aktardı. Toplantıda Ulusal Kongre konusunun da gündeme geldiğini ifade eden Maxmuri, "Kürdler her zamankinden daha fazla dayanışma ve yakınlasmayı sağlamış bulunuyor. Toplantıya katılan tüm temsilciler de Ulusal Kongre'nin yeniden toplanmasını önerdi. Bence de



en yakın zamanda kongre toplanabilir" dedi. (z.c)



Barzani yeni projeler için Uluslararası Banka'dan kredi talep etti

BasNews/HaberMerkezi - Kürdistan Bölge Başkanı Neçirvan Barzani, elektrik, su, yol ve köprü yapımını içeren 4 yeni proje için Uluslararası Banka'ya bir mektup göndererek kredi talep etti.

Konu hakkında BasNews'e konuşan Soran Ömer, Uluslararası Banka'nın Irak ve Lübnan Sözcüsü Robert Bu Cude'nin "Başbakan Barzani resmi bir mektupla

bizden kredi talebinde bulundu" dediğini aktardı. Uluslararası Banka diploması bulunan Soran Ömer, temsilci Robert Bu Cude'nin ayrıca "Bu kredi, Kürdistan Bölgesi'nde yapılması hedeflenen 4 büyük proje için isteniyor. Projeler bölgede elektrik, su, yol ve köprü yapımını içeriyor" dediğini belirtti. Aralık ayının 15'inde uzmanlardan oluşan 12 kişilik bir heyetin

Kürdistan'a gelip projeler hakkında incelemelerde bulunacağını söyleyen Ömer, "Bu durum, Kürdistan Bölgesi'nin Uluslararası Banka'nın yardımlarından yararlanabilmesi için çok önemli bir başlangıçtır" değerlendirmesinde bulundu. Daha önce de Başbakan Yardımcısı Kubat Talabani, Kürdistan Bölgesi'nin Uluslararası Banka'dan talep edeceği kredinin memur maaşlarının ödemesi için değil çeşitli projelerin yapımı için olacağını açıklamıştı. (z.c)

Kürdistan önemli konuklar ağırlayacak

Önümüzdeki günlerde Türkiye Başbakanı Davutoğlu, ABD Başkan Yardımcısı Biden ve ardından da ABD eski başkanlarından Carter, Güney Kürdistan'ın Başkenti Hewlêr'i ziyaret edecek. Irak ve Kürdistan Bölgesi'nde IŞİD krizinin başlamasından bu yana değişik dünya ülkelerinden lider ve yöneticiler Kürdistan Bölgesi'ni

ziyaret etti. Diplomasi trafiğinin yoğun olduğu Hewlêr, önümüzdeki günlerde de önemli konuklarını ağırlayacak. ABD Başkan Yardımcısı Joe Biden, Ukrayna ve Türkiye ziyaretlerinin ardından Irak'a geçecek. Biden'in 17-18 Kasım'da Hewlêr'de olması bekleniyor.

Irak basını Türkiye Başbakanı Ahmet Davutoğlu'nun



21 Kasım'da Bağdat'a geleceğini yazdı. Irak Dışişleri

Bakanı İbrahim Caferi'nin geçtiğimiz günlerde gerçekleştirdiği Ankara ziyaretinin ardından Davutoğlu'nun bu gezisi "iki ülke arasındaki ilişkilerin yumuşaması" olarak nitelendiriliyor. BasNews'in KBY yetkililerinden edindiği bilgilere göre, Davutoğlu Bağdat ziyareti ardından Hewlêr'e geçecek ve Kürdistan Bölge Yönetimi ile

görüşecek. Görüşmelerin gündeminde ise ittifak arasındaki ilişkiler ve IŞİD'e karşı ittifak var. Aralık ayının başında ise ABD eski başkanı Jimmy Carter Hewlêr'de olacak. 1977-81 yılları arasında ABD başkanlığı yapmış olan Carter'in Hewlêr ziyareti ise destek amaçlı. 2002 yılında Nobel Barış ödülü alan Jimmy Carter'in da Kürdistan Bölge Yönetimi'nden isimlerle görüşmesi bekleniyor.

